

Em ber bi pêşwaziya Cejna 2'yê Rêbendanê, 62'hemîn salvegera avabûna Komara Kurdistanê di sala 1946'an li bajarê Mehabadê ji aliyê PDK Îranê ve diçin. Komara Kurdistanê yekemîn dewleta kurdî a modern bû û gellek destkevtiyên girîng û dîrokî di karmanya xwe de tomar kir. Bi boneya vê cejna neteweyî em pîrozbahiyên xwe ên germ û gurr pêşkêşî neteweya Kurd dikin. **Desteya Weşana Agirî**

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê diweşîne

### Daxuyaniya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Derheq Hilbijartinên Meclîsa Heştêm



2

#### Gotinên Wê Dawiyê Yên Ocalan û Çend Têdîtinek



3

#### Encamnameya Azadiya Çapemeniyê Di Sala 2007'an De



6

#### TÊGIHÎNA NAMÛSÊ



7

#### ÇAND-HUNER-WÊJE



9

#### Panoramaya 2007'ê li ser Rewşa Ziman, Çand û Rewşenbiriya Kurdî



10

## BAYKUTA HILBIJARTINAN

► Navenda binav Hilbijartinên Komara Îslamî a Îranê, di daxuyaniyekê de, roja îne 24'ê Reşemeya 1386(14'ê Adara 2008)yan, weke roja birêveçûna heştêmîna gera binav hilbijartinên Meclîsa Şewra Îslamî a Îranê diyarî kir. Li gorî agahiyan hejmara kesên ku xwe ji bo berbijariyên navnîvîs kirine, nîviya tora berê bûye. Vê navendê eşkere kir ku 5806 kesan navê xwe nivîsandiye ku 405 kes



jin in û 851 kesan jî ji bo bajarê Tehranê navê xwe nivîsandine. Hejmara vê carê nîva hejmara beşdariya berendamîna di gerra berê de ye.

Pirraniya partiyan siyasî yê Kurdistanê Rohilat yê îlegal û qedexekirî, nemaze PDK Îranê ku partiya herî mezin a Kurdistanê Îranê ye, hilbijartinên han baykut kirine û daxwaza ji xelkê kirine ku beşdarî hilbijartinan nebin.

Zanyariyên berfirehtir di vê hejmara Agirî de...

## Buş: "Îran Gefê Li Ewlekariya Cîhanê Dike"

► Serok Komarê Amerîkayê, "George Bush", roja yekşem, 13.01.2008'an, di gerra xwe a ji bo Rohilata Navîn gihîştê Mîrîtiyên Yekbûyî ên Erebi û di axavtinekê de got: "Îran gefê ji ewlekariya cîhanê dike". Wî ji welatên Erebi daxwaz kir bi Amerîkayê re tevî vê xeterê berengariyê bikin.

Wî got: "Îran ji hêz û girûpên tundajî û radîkal ên terorîst piştevanîyê dike, aştîya Lubnanê xistiye xeterê, ji biryarnamêyên



Neteweyên Yekbûyî baz dide û bi domandina bernameya xwe a Etomî, hemû herêm bêewle kiriye". Buş di doma axavtina xwe de got: "Îran welatê herî girîng di cîhanê de ye ku piştgiriyê ji terorîzmê dike û xebatên Îranê gefê li ewlekariya hemû welatên cîhanê di xwe.

## Li Kurdistanê Zivistanê Dijwar Heye, Şewat Bi Kêmî Dest Dike

► Zêdetirî heftiyekê ye ji ber barîna berfê û bagerê, pirraniya bajarên Kurdistanê Îranê zivistanê dijwar derbes dikin û şewata weke gaz, nift û wd... bi kêmî dest dikeve. Ji ber vê yekê rêyên gellek gundan ji bo bajarên hatine girtin. Li hin deverên Kurdistanê Îranê û bajarên din stûriya berfê gihîştê 1 M'yê û serma jî daketiye -25 C.



Di vê rewşê de, gellek bajarên Îranê û nemaze yê ku berf û bagerê tê de bariye, gaza mal û cihên xizmetên giştî, navendên perwerdehiyê û qut bûye û şewat bi dijwarî û kêmî peyda dibe. Berpirsiyarên Komara Îslamî a Îranê heta niha nekarîne bona van pirsgirêkane tu gawekê bavêje û alîkariya xelkê bikin.

Herwiha ji ber asta bilind a cemedê, gellek astengî derdikevin pêşberî rêwiyên.

## Daxuyaniya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Di Derheq Binav Hilbijartina Gerra Heştan Ya Meclîsa Şewra Îslamî De

**H** ewwelatîyên hêja!  
Xelkê azadîxwaz yê  
Kurdistanê!

Navenda binav Hilbijartinên Komara Îslamî a Îranê, di daxuyaniyekê de, roja îne 24'ê Reşemeya 1386(14'ê Adara 2008)an, weke roja birêveçûna heştamîn gerra binav hilbijartinên Meclîsa Şewra Îslamî a Îranê diyarî kir û li gorî vê qîrarê rejîmê daxwaz ji kesên ku dixwazin xwe berbijar bikin, kiriye ji berrav 05.01.2008'an heta 11.01.2008'ê vê mehê derfet heye xwe ji bo vê meremê navnivîs bikin.

Bêguman hilbijartina demokratîk bi armanca pêkanîna rewş û delîvê jêhatî ji bo birêvebirina kar û barên welat, yek ji bingehên sereke ên demokrasîyê ye û beşdarî di hilbijartineke wisa de, erk û wezîfeya tev tak û welatîyê ye ku di xema berbipêşveçûna civakê de ye.

Lê pirsyara sereke eva ye, gelo Komara Îslamî, sistemeke demokratîk e heta hilbijartinên demokratîk rêve bibe? Gelo dengder dikarin deng bi berendamê/a cihê hitbar û dilxwazê/a xwe bidin? Gelo nûnerên Parlemanê li gorî yasayê li pejiwandina ew qanûnên ku di xizmeta pêşveçûna civakê de ne, serbest û azad in?

Ceribîna binav hilbijartinên derbasbûyî ên rejîmê, selimandîye ku di hemû binav hilbijartinan de û yek ji wan di binav hilbijartinên Meclîsa Şewra Îslamî de, di navbera tev daxwazkarên berbijariyê de, tenê çend kesekî/e dilxwazên rejîmê kêrhatûbûna wan tê erêkirin û yê din bi hêcet û mihaneyên neqanûnî, kêrhatûbûna



wan tê betalkirin, redkirin û piştê rê ji xelkê re tê dayîn di nav wan çend kesên dilxwazên rejîmê de, deng ji kesekê/î yan hin kesan bidin û di rewşeke wisan de jî êşkere ye, hilbijartinê dî di naverok û kakila xwe de betal û vala dibe, ji ber ku kesê/a bi rûyekî hilbijartî, hilbijartiyê/a desthilatê ye, nek bijartiyê/a hevzelatîyan. Lewra me dîtîye ku di van çend salên dawiyê de ew şano û bazare li rewneqê ketiye û xelkê zana, hişyar ê Îran û Kurdistanê di hilbijartineke wilo de beşdariyê nakin. Heke çî herdem piştî hemû hilbijartinekê, rejîm îlan dike ku piraniya xelkê di hilbijartinê de beşdarî kiriye û bi vê boneyê jî, rejîm binav spas û pêzanîne ji xelkê dike. Lê hem rejîm û hem xelk jî baş dizanin ku ew gotinene propagandayên pûç û bênaverok in.

Lewra ji niha ve, ron û êşkere ye, encama şanoya binav hilbijartina Meclîsa Şewra Îslamî, nikare cuda ji encama binav hilbijartinên berê ên rejîmê be. Her loma,

xelkê azadîxwaz yê Îranê bi giştî û xelkê hişyar yê Kurdistanê bi taybetî, li ser sindoqên binav hilbijartinekê hazir nabin ku bi çavê xwe rojane, şahidê serkut û çewsandina xwendekar, kedkar, mamosta, jin, ciwan û bi giştî tev çî û texên civakê ne ku bi guneh û tawana xebat ji bo mafên herî destpêkî ên xwe, bêhurmetî bi wan tê kirin û tî girtin, îşkence û heta îdamkirin û binav nûnerên xelkê jî di Meclîsê de, peyvekê li ser wan hemû zulm û stemkariyane bas nakin. Xuya û aşkera ye piraniya xelkê naçin bo ser sindoqeke wisa ku sindoqa rewayî û berheqîdan bi rejîmekê ye ku tu cure rewayiyek nemaye û di bîr û raya giştî a cihanê de, bi rejîma herî azadîkuj a vî serdemî hatiye binavkirin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, hevdeng tevî gişt azadîxwazên Îran û Kurdistanê, daxwazê ji xelkê mafxwaz yê Îranê û civatên şoreşger ên xelkê Kurdistanê dike, wekî berê, bi beşdarînekirina berfireh a xwe di wê şanosaziyê de, careke din **NA**'yeke din a xurt û agirîn bibêjin Komara Îslamî û ji bîr û raya giştî a xelkê cihanê re biselîmînin ku ji wê rejîmê bêzar in, nefretê jê dikin û berheqiyê jêre nadin û çî din bi pîlan û fend û fêlên wê rejîmê naxapin û bi vî awayî erkê xwe di vê dema hestiyar ji bo azadiyê encam bidin, bicî bigehînin.

Serkeve xebata rewa û berheq a neteweyên pêkîner ên Îranê ji bo demokrsî û mafê neteweyî!

Mirin û neman ji bo rejîma azadîkuj a Komara Îslamî a Îranê!

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Deftera Siyasî**

**13'ê Berfanbara 1386'an  
3'ê Çileyay Pêşîn a 2008'an**

### Karbidestên Rejîmê Tevî Nêzikbûn Bi Şanoya Hilbijartinê, Hewlên Xwe Ji Bo Haydana Xelkê Mako û Selmasê, Dest Pê Kirine

► Li gor agahiyên Navenda Nûçeyan ya PDK Îranê, karbidestên rejîma Komara Îslamî a Îranê li bajarên Xoy û Selmasê, tevî nêzikbûn bi hilbijartinên Meclîsa Şewra Îslamî, hewlên xwe ji bo rakişandina xelkê bi armanca beşdarîkirin di vê şanoyê de, dest pê kirine.

Di vê derheqê de, karbidestên rejîmê li bajarên han de, serbarê gazîkirina xelkê ji bo endambûn di Hêza Besic de û bidestveanîna îmtiyazên aborî di vê derheqê de, daxwaz ji xelkê kirine ku di şanoya hilbijartinên Meclîsa Heştam de, beşdariyê bikin.

Ezmûna bi nav hilbijartinên berê û çî bi çî nekirina ew sozên ku beriya hilbijartinan ji aliye berpîrsên Komara Îslamî a Îranê ve bi xelkê dihate dan, yek ji wan çaresernekirina pîrsa hewcehiyên destpêkî ên weke nift, gaz û wd... di demsala zivistanê de, bûye sedema vê çendê ku xelk piştevanîyê ji daxwazên karbidestên rejîmê nekin.

Hêjayî gotinê ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di daxuyaniyekê de, daxwaz ji xelkê kiriye ku di bi nav hilbijartinên Meclîsa Heştam de beşdarîyê nakin.

### Eniya Reformîstên Kurd Di Hilbijartinên Meclîsa Heştam De Beşdariyê Dike

► **Husên Firozî**, berpîrsiyarê Navenda Eniya Reformxwazên Kurd, di heftiya borî de da xuyakirin ku ev enî di hilbijartinên Parlemana Heştam de bi merca wekhevî û dadweriyê de beşdariyê bike. Her di vê derbarê de, **Ebdula Remezanzade**, Berdevkê dewleta berê û Waliyê pêşîn ê Kurdistanê, ji bo hevahengkirina partî û rêxistinên 2'yê Cozerdanî li herêmên Kurdakincî hatiye erdkarkirin. Bona vê yekê, wî tevî **Celal Celalîzade**, **Seyid Haşim Hidayetî**, **Husên Firozî** û **Xalid Tevekulî** komîteyek ji bo zêrevanî û çavdêrîkirina rewşa hilbijartinan li bajarên Kurdistana Îranê pêk aniyê.

Hêjayî gotinê ye ku Reformîstan li Parêzgehên Azerbaycana Rojava, Kurdistan, Kirmaşan û Îlamê mijûlê çalakîyên teblîxî ên hilbijartina Meclîsa Heştam in û di vê derheqê de serdana kesayetiyan navdar û xelkê kirine û dikin. Lê di rastî de Reformxwaz mijûl in careke din xelkê tûşî şaşî û çewtiyê bikin û bi soz û qîrarên pûç û vala xelkê dengder ji bo aliye xwe radikişînin. Çavkaniyên nûçeyan wisa bas dikin ku rengê vê hindê nade xelkê bajarên Kurdistanê careke din li ser wade û sozên guhertinxwazan di hilbijartinan de beşdar bibin.



## Daxuyaniya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Li Ser Gotinên Wê Dawiyê Ên Birêz Ebdula Ocalan

**L**i gor nûçeyekê ku malpera "renesans"ê ji Ajansa Nûçeyan a Firatê wergirtiye, birêz Ebdula

Ocalan Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) derheq êrîşên wê dawiyê ên Turkiyê bo ser Başûrê Kurdistanê û doza Kurd bi giştî, hinek babet û mijarên girîng û ecêb bas kirine ku şîrove û dahûrandineke zaf hildigire.

Birêz Ebdula Ocalan di wan gotinên xwe de – ku ji aliyê Konseya Serokatiya wê pariyê ve jî hatiye erêkirin – careke din nigeraniya xwe li dor pêkhatina dewleta neteweyî li Başûrê Kurdistanê dide xuyakirin û serkevina wê pîlan û projeyê bi **serkevina hêla Amerîka – Îngilistanê** dihesibîne û gefê dixwe ku li hemberî wê pîlanê de dê peymanê Kurd – Şîe bi Îran û Sûriyê re girê bide. Li pasawa wê hevalbendiyê jî dibêje: "Xwe bixwe li Îranê welayetek heye bi navê Kurdistan, heke kêm jî be cure otonomiyek **ji bo Kurdên Îranê** heye. Heke Îran wê welayetê

**Kurdên Îranê rê nadin tu kesî ku mafê neteweyî ê wan ku hezaran gorî jê re dane, di Parêzgeha Kurdistanê de bertesk bikin. Parêzgehek ku tenê navê wê Kurdistan e û tu desthilateke Kurdî bi ser de nîne**

kêmekê berfirehtir bike û îtirafê bi PJAK'ê bike, em jî dê bibêjin, kerem bike eva jî arteşek 100 hezar kesî ...".

Derbarê wan gotinan de em bi hewce dizanin dîtî û nêrîna xwe ji raya giştî re xuya û eşkere bikin:

1. Ew hevalbendiyê 3 qolî nek her PKK'ê jî wê kirz û qeyarana ku ketiye têde, rizgar nake, belku PKK'ê dê bi kiryar û piratîk bike hêzeke serkutker û çewisînerê xwestek û daxwazên azadîxwazane ên gelê Kurd li Îranê û parçeyên din yên Kurdistanê, nemaze ku encama hevalbendiyê berê a wan tevî Sûriyê jî niha ve gellek bi zeqî xuya ye. Lewra em tevî xuyakirina

nigeraniya xwe ji wan dîtî û nêrînane, hêvi dikin ku PKK xwe ji vê bîr û dîtîne dûr bixe û tûşî şaşiyêke wisa mezin nebe.

2. Îtirafkirina Komara Îslamî tu cure rewê û berheqiyekê ne bi PKK'ê û ne bi çî hêzeke din nade, her wekî çawa ew hemû hêzên ku di herême de hevalbendên Îranê ne, li ber çavê dunyayê û raya giştî şeriyet û rewatiya wan tune ye û bi terorsît û dijberên aştiyê tèn zanîn û hesabandin.

3. Kurdên Îranê rê nadin tu kesî ku mafê neteweyî ê wan ku hezaran gorî jê re dane, di Parêzgeha Kurdistanê de bertesk bikin. Parêzgehek ku tenê navê wê Kurdistan e û tu desthilateke Kurdî bi ser de nîne. Ji bilî wê çendê Kurdên Îranê ew hinde têgihîştî û zana ne ku bixwe çarenivîsa xwe diyarî bikin û hewcehiya wan bi vê yekê tune ku rêzdar Ocalan ji Girtîgeha Îmraliyê ve çarenivîs û qedera wan diyarî bike.

Em bi dilsozane hêvi dikin ku PKK ew gewtî û şaşiyên siyasî dubare neke ku di derbasbûyî de hebûye û em li benda vê yekê ne di vê rewşa hesas û hestiyar de bi têdîtî û dahûrandina kûr û berfireh û li ser berjewendiyên neteweyî biryarê bide.

**Partiya Demokrat Ya Kurdistanê Îranê**  
**Deftera Siyasî**  
**31.12.2007**

## Gotinên Wê Dawiyê Yên Ocalan û Çend Têdîtinek

**Diyako Firoxî**  
**Wergeran/ Selîm Zencîrî**

**B**akûrê Kurdistanê, weke parçeyê herî mezin yê Kurdistanê, rolek herî girîng û çarenivîssaz di bizava

neteweyî ya Kurd de listiyê û çeqmaq û birîsçeya bizava hişyariya neteweyî bo cara yekemîn di destpêka sedsala 20'an şûn de û ji rêya rewşenbîrên wê parçeyê Kurdistanê hate lêdayîn, paşan tîrojken wê gihîştine parçeyên dinê. Bizava Kurd li parçeyên din yên Kurdistanê bi îlham wergirtin ji bizava hişyarî û xweagahiya netewî ya Bakûrê Kurdistanê, her yekê bi awayekê û di çarçoveya komek rastiyên hestiyar yên hundirîn, deverî û navnetewî de partiyên siyasî yên taybet bi xwe ava kirin.

Kê û zêde, rolek girîng di berbepêşdeçûna bizava rizgarîxwazî a Kurdistanê de listin û her yek ji wan bi awayekê, xebata xwe ji bo bidestveanîna maf û azadiyên gelê Kurd praktîze kirin.

Lê mixabin bizava netewexwazî li Bakûrê Kurdistanê, ji ber zalbûna îdeolojiya pawanxwazî ya Kemalîzmê bi ser welatê Turkiyê de, bi awayekî hovane û sistematîk hate tepeserkirin û cehd û tekoşînek dijî mirovî ji bo aşmîlekirina ziman û kultura Kurd dest pê kir. Gelê Kurd li Bakûrê Kurdistanê ne tenê ji mafên siyasî û aborî yên xwe hatin bêparkirin, belkî mafê axafî bi zimanê zikmakî ku ji mafên herî destpêkî û sirûştî yên her gel û neteweyekê ye, di praktîk û li yasayê de jî ji wî gelê mafxwarî



hate standin û bi vî awayî apartayda regezi û kulturî bi awayek hovane li ser gelê Kurd li Bakûrê Kurdistanê de peya kir.

Piştî birêveçûna bi dehan sal tepeserkirina sistematîk li ser gelê Kurd, di destpêka dehsala 80'ê a Zayînî de, Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) avabûna xwe ragihand û bi vî awayî jîlemoya şoreşê geş bû û serhildaneke mezin li bin dar û perdikên kavlîkirina îdeolojiya Kemalîzmê de çê bû.

Herçend avabûna PKK'ê bi qonaxekê nû ji xebata rizgarîxwaziya Kurd tê zanîn, lê bi sedema wê ku partiya han di bingeh de partiyek Marksîst – Lênînîstî ya Rojhilatî bû, bi hêvîyê tîr yê ortodoksî, bi çend sedeman nekarî çavniheriyên civaka Kurd bidest bixe û di her qonaxek li xebata xwe de tûşî komek şaşî û xeletiyên stratejîk bûye:

1. Avabûna PKK'ê weke hizbeke Marksîst – Lênînîstî, ji dayîkbûnek bêwext bû, ji ber ku berî avabûna wê partiyê, Marksîzm – Lînîzîzm bi xwe û bi taybet raveya ortodoksî ya wê tûşî kirîzek teorîk û

praktîk hatibû. Pîrsa Komonîzma Karkerî di halê riswayî û hiloşînê de bû û Soviyet wekî rûgeha Komonîzmê di hundirê xwe de ber bi heliyane diçû.

Mixabin avakarên PKK'ê bêagah ji wan guhertinan û li ser bingeha wan teoriyan, teorî û praktîka xwe darêtin, ku li melbenda jidayîkbûna xwe de tu kiryarê wê nemabûn.

Niha jî piştî borîna 20 sal li ser hiloşîna diwarê Berlînê û hiloşîna Soviyetê, hêj rêberên PKK'ê pêdeçûn bi têz, teorî û bingehên fikrî û îdeolojîkî yên xwe de nekirine û heya niha peyvek di vê derheqê de, ne ji rêberên wê hatiye bihîstin û ne jî di ragihandinên giştî yên wê de reng vedaye.

2. Armanca PKK'ê weke her partiyek Komonîstî, pêkanîna civakek Komonîstî ye. Weke Marks dibêje Proltariyayê tu welatek nîne, lê rêberên PKK'ê tu demekê di ragihandinên xwe de bi eşkere li ser vê mijarê nepeyivîne, heta ji bo rakîşandina hêza xelkê bo aliyê xwe dirûşma rizgarkirina Kurdistanê mezin avêtin. Lê di kiryar de ji ber ku wê demê, birêz Ebdula Ocalan li bajarê Demişq a Sûriyê de akincî bû û dijiya, him Ocalan û him jî endamên rêveberiya wan, Kurdistanîbûna Rojavayê Kurdistanê (Kurdîstana Sûriyê), înkâr dikirin û nemaze alîgirên wan digotin: "**Bakûr, Başûr, Rojhilat – Apo Serokê welat**" û bi vî awayî Kurdistan bibû bi welatek ku tenê ji ber bixêrhatinkirina **Hafîz Esed**, tenê xwediye Bakûr, Başûr û Rojhilatê bû û baskirin ji Rojava jî bive bû (di vê derheqê de hûn dikarin mêzeyî pirtûka "Sîbeeyam mee Ebo" bikin).

3. PKK take rêxistînek Kurdî bû ku bi eşkere tevî Hikûmeta Herêma Kurdistanê dijberî dikir û heta Parlemana Kurdistanê

Îraqê bi Federasiyona eşîretan dihesiband.

4. PKK take rêxistina Kurdî ye ku bi eşkere maytêkirin di kar û barên hundirîn yên parçeyên din ên Kurdistanê de dike û rêxistinên girêdayî bi xwe tê de ava dike û cehdê dike ku ji hêz û petansiya mirovî a parçeyên din yên Kurdistanê bi awayek taktîkî û weke alavekê mifahê bistîne.

5. PKK take rêxistina Kurdî ye ku hevdem digel sê dagirkerên Kurdistanê, (rejîma berê ya Îraqê, rejîma Sûriyê û Îranê) di pêwendiyê de bû û îdea dikir ku hêzek rizgarker e. Lê dema ku dikete bin givaş û zextên wan dewletan de, 180 derecan dizivirî, her te digo çî neqewimiye!! Bo mînak dema ku Ebdula Ocalan li Kenyayê hate girtin, xelkê Rojhilatê Kurdistanê bi merema hevderdî û hevxiyatiya bi Kurdên Kurdistanê Turkiyê re rijiyane ser şeqaman û hevdem digel hevxiyatiya bi nisbet girtina Ocalan re, xwastek û daxwaziyên xwe ji anîn ziman. Dirûşmên weke "Mîrin bo Komara Îslamî" û "Qasimlo, Qasimlo, rêya te dirêjî heye" diqirandin. Bi taybet li 3'ê Reşemeya 1377'an(1998) li bajarê Sine de bi dehan kes ketine ber êrîşa hêzên rejîmê û di nava xwînê de gevizandin, lê mixabin Komeleya Serokatiya PKK'ê di daxuyaniyekê de bona xweşxizmetî bi rejîma Xumênî, ciwan û xortên bi hest û welatparêz yên Kurdistanê Îranê bi Kemalîst bi nav kirin.

Xêncî wan hemû şaşî û xemsariyên ku li jor qala wan hate kirin, xala herî lawaz a PKK'ê û rêveberiya wê eva bû ku piştî destbiserkirina Ocalan, Komeleya Serokatiya PKK'ê ne tenê nekarî xwe ji hejmoniya Ocalan rizgar bike, belkî nekarî bi meşandina hin reforman xwe di nava hevkeseyên siyasî yên piştî 11'ê Îlonê de ji cih bide û bi vî awayî delîveyekê bo xweguncandin tevî pêvajoyê prosesa demokratîzasiyona devera Rojhilata Navîn pêk bîne.

Ji ber ku çarenivîsa PKK'ê pêtir ji caran bi Ocalan re girê da. Heya ku di bin çavederî û zêrevaniya Mît a Turkiyê û li zîndana Îmraliyê ve, konfederalîzma demokratîk di devera Rojhilata Navîn de cihgir bike.

Têz û teoriya herî dawîn ya birêz Ocalan, pêkanîna hevalbendiya Kurd+Şîr+Îran+Sûriyê ye ku emê hewlê bidin wê sîrove û analîz bikin.

Birêz Ocalan di gotinên xwe yên dawîn de ku Ajansa "Firat"ê û ROJ TV'yê ji weşand, nîgeraniya xwe ji pêkhatina dewleta neteweyî li Başûrê Kurdistanê de tîne ziman û serkevîna azmûna binirx a Herêma Kurdistanê bi pîlana Împeryalîzma Amerîka – Îngilîzê!! dihesibîne. Eva jî di halekê de ye ku neteweya Kurd û tev partiyên siyasî û resen yên Kurd, bi çavên hêviyê ve mîzeyî vê azmûna bihagiran a Başûrê Kurdistanê dikin ku xwe di Hikûmeta Herêma Kurdistanê de dibîne û amade ne ku bi dil û can parêzvanîyê jê bikin, çunku ceribîna han berhema tekoşîn û xebata bi dehan salî ya Kurdan e.

Ya ji wê jî ecêbtir, ev e ku birêz Ocalan

gefan dixwe û dibêje hewce ye li hemberî vê pîlan û komploya Amerîka û Îngilîs de, (anku pêkhatina Hikûmeta Herêma Kurdistanê), hevalbendiya Kurd + Şîr + Îran + Sûriyê pêk were.

Dîsan seyar û ecêbtir ji wê jî dibêje: "Li Îranê di esas de eyaletek bi navê Kurdistanê (merem Parêzgeha Kurdistanê ye) heye, her çend ku kêma û bertesek jî be, lê dîsan otonomiyek e ji bo Kurdên Îranê. Ger Îran vê Parêzgehê hinek din jî berfirehtir bike û PJAK'ê jî bi fermî binase, wê demê em jî dê jêre bibêjin! ha kerem bike eva jî hêzek 100000 kesî".

Derheq wan gotinên Ocalan, em bi hewce dizanin ku di çend xalan de têdîtinên xwe binin ziman.

1. Berevajî nêrîn û gotinên Ocalan, Hikûmeta Herêma Kurdistanê ne tenê encama pîlana Amerîka û Îngilîs nîne, belkî encama xebat û tekoşînek dijwar û bixwîn e, destkefta herî binirx û bihagiran ya bizava rizgarîxwazane ya Kurdan, aliyê kêma di sedsala dawiyê de ye.

2. Berevajî nêrînên wî, tevgera Kurd bi berçavkên îdeolojîk ve mîzeyî pêwendiyên siyasî yên navneteweyî û deverî nake û li ser vê baweriyê ye ku berjewendiyên hevbeş, pîvan û merca pêwendiyên dîplomatîk e, ne teoriyên kevinbûyî û pasîv yên îdeolojîk.

3. Bizava neteweyî û demokratîk a Kurdistanê berevajî nêrînên birêz Ocalan, ne tenê xwe bi hevalbendê rejîmên Îran û Sûriyê nizane, ji ber ku wan du rejîmên tepeserker bi zevtkerên maf û azadiyên gelê Kurd dizane û bi dehan sal e ku xebatekî bêrawestan li dijî wan du rejîmên serberedayî dest pê kiriye.

4. Mêhwera Îran + Sûriyê, tewera fitne, şer û terorê ye. Di halekê de ku tevgera neteweyî a Kurd di eniya demokrasî û dijî terorîzmê de cih girtiye.

5. Bo agahdariya birêz Ocalan, xincî parêzgeha Kurdistanê, parêzgeha Azerbaycana Rojava, Kirmaşan, Loristan û Îlam û parek jî parêzgeha Hemedanê jî Kurdakincî ne û ne tenê Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de xwedî otonomî nîne, belkî ji mafên xwe yên herî destpêkî, siroştî û mirovî bêpar in û bêtir ji 6 dehsalan e ku ji bo misogerkirina hemû maf û azadiyên xwe di xebatekî rewî û demokratîk de ne.

6. Xelkê Kurdistanê Îranê, PJAK'ê bi rêxistinêk serbixwe nizanin û ev gotina birêz Ocalan bi tevahî perde li ser girêdayîbûna PJAK'ê avêt û berevajî nêrîna Ocalan, eva Komara Îslamî nîne ku meşrûiyet û rewatiyê dide rêxistinên Kurdistanê, belkî eva xelkê welatparêz û şoreşvan yê Kurdistanê ye ku biryara xwe ya dawîn li ser partiyên dide. Girîngtir ji wê jî, rejîmekê ku bi xwe rewati nebe, çawan dê bikaribe berheqiyê bide PJAK a birêz Ocalan?!


7. Tevera neteweyî – demokratîk a Kurdistanê û xelkê xebatkar û welatparêz yên Kurdistanê Îranê, rê û iznê bi tu kes û aliyekê nadin ku maf û azadiyên wan bikin bi destmaya bazirganiyên siyasî. Herwiha

hişyartir û agahitir ji wê yekê ne ku hewcehî bi birêz Ocalan hebin heya ku di zîndana Îmraliyê de bi çarenivîsa wan bilîze. Ger em bêjin ku Ocalan di bin zext û givaşên Mît a Turkiyê de, neçar bi gotina wan axaftinan hatibe kirin, erê gelo piştrastkirin û pesendkirina gotinên han ji aliyê Komeleya Serokatiya PKK'ê ve, tu cihêkê ji bo guman û dudiliyê dihêle ku eva siyaseta fermî ya PKK'ê ye.

Di dawiyê de em hêvî dikin ku Komeleya Serokatiya PKK'ê bi pêşde girtina siyaseta demokratîk û neteweyî, piştî û çarenivîsa xwe bi Komara Îslamî a Îranê ve girê nede. Çunku Komara Îslamî ber bi nemanê ve taw ketiye û her partiyek, çarenivîsa xwe bi vê rejîmê ve girê bide, ji bilî rojreşî û têkçûnê, tu pêşerojek nabe.

Em bi hewce dizanin vê rastiyê ron bikin ku rexneyên me di vî wextî de ku him ji bo PKK'ê û him ji bo hemû Kurdan gellek hestiyar e, tenê bi merema hişyarkirina vê rêxistinê ji xeterên ku li ser rêya wê ne, ne armançek din.

#### Şandeke PDK Îranê Seredana Rêxistina Komeleya Zehmetkêşên Kurdistanê Îranê – Rewta Çaksazî û Geşepêdanê Kir



Roja çarşem, 09.01.2008'an, şandeke PDK Îranê bi serokatiya birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî ê PDK Îranê, seredana rêxistina Komeleya Zehmetkêşên Kurdistanê Îranê – rewta çaksazî û geşepêdanê kir.

Di vî hevdîtinê de, her du alî li ser pirsên herêmê ên weke êrîşên Turkiyê bo ser axa Herêma Kurdistanê, Îraq, Felestîn û nemaze zirûfa niha ya Îranê, opozîsyona Kurd û Îranî û pîrsa Kurd bi berfirehî axivîn û bîr û ra guhertin.

Her du aliyên hîlbijartinên rejîmê bi giştî weke hîlbijartinên rûyekî hesabandin û li ser vê baweriyê bûn ku tenê nûnerê rejîmê ne ku dikarin biçin meclîsê. Lewra divêt xelk bi beşdarî nekirin di binav hîlbijartinên rejîmê de, her weke berê "NA"yek din bêjin rejîmê û ji giştî xelkê çîhanê re bidin îsbatkirin ku rejîma Komara Îslamî a Îranê ne xwediyê rewabûnê ye û ne nûnerê xelkê Îranê.

Her wiha her du aliyên li ser yekîtiyê û hevalbendiya hêzên Kurdî û hemû sazîyên neteweyên bindest ên Îranê ji bo gihîştin bi azadî û mafên xwe tekez kirin.

Hêjayî gotinê ye şanda PDK Îranê pêkhatibû ji birêzan Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî ê PDK Îranê, Têmur Mistefayî, endamê Deftera Siyasî, Husên Nazdar, endamê Komîteya Navendî, Şaho Ferazmend û Elî Soranî, endamê Şewirmend ên Komîteya Navendî a PDK Îranê ku ji aliyê birêz Omer Îxanîzade, Newîd Mêhrer, Baran Rizayî, Sebah Emînî, endamên Birêveberî û Aram Muderîsî û Emîr Selewatî ve, bi germî hate pêşwazîkirin.



## Dijwariyên Zivistanê Jiyana Xelkê Urmîyê Tal Kiriye

**D**i çend rojên borî de, ji ber nizimbûna dereceya hewa li pîrraniya herêmên Îranê, li bajarê Urmîyê jî xelk bi xurtiyek zêdetir bi vê dirûyê û rewşê re berbirû bûye û zivistanek dijwar derbas dikin. Ji ber barîna berfê û bagerê ku bûye sedema nizimbûna dereceya hewa, ji roja sêşem, 08.01.2008'an, virde li pîrraniya tax û bajarokên bajarê Urmîyê gaz hatiye qutkirin. Ev hal û rewşê ji bo 50 ji sedê a xelkê pêk hatiye û heta gihîştina vê raporê rewşa han her berdewam e.

Di rojên derbazbûyî de, berpîrsiyarên dewletî bi soz û qirarên çêbûna dirûvê û rewşê û girêdana dubare a gazê, dest bi xapandina xelkê kirine. Rayedaran tenê karek ku ji

bo xelkê encam dane, dayîna 40 lîtir petrolê bi buhaya 1000 tûmenan ji welatiyan re bû ku ew jî tenê gihîştê destê hejmarek kêr ji xelkê.

Rêzên dirêj ên rawestana xelkê û pevçûnên navbera



welatiyan di rêzên bîdestxistina niştê taliya rewşê û dirûvê du qat zêde kiriye.

Di çend rojên borî de, tenê navenda bajarê Urmîyê, ew jî car caran gaz hebû. Ji ber nebûna gazê û karnekirina nanpêjxaneyan buhaya her naneke gihîştê 200 tûmenan û ew jî nakeve destê her kesî, nan bi zehmet û dijwarî peyda dibe.

Êvariya roja îne, 10'ê Çileyay Paşîn xwendekarên zanîngeha Urmîyê ku çend roj bû ji ber nebûna gazê û sira dijwar a zivistanê li xewgehên bêzar bibûn, li ber deriyê Parêzgarîyê li bajarê Urmîyê gireva nerazîbûnê lidarxistin. Di halekê de ku hewa pîrr nizm bû û berf bi xurtî dibarî, xwendekaran heta hatina Parêzgar û Serokê Zanîngehê gireva xwe dom kirin, bi soz û wadeya berpîrsiyaran ji bo çêbûna rewşê û dirûva pêkhatî, gireva han a nerazîbûnê di

bin serma û dijwariya hewayê zivistanê Urmîyê seet 19'ê şevê bi dawî hat. Gireva han a nerazîbûnê ji seet 15'ê êvar dest pê bibû, berpîrsiyaran tenê karek ji bo xwendekaran kirin, ew jî paşdexistina



ceribandîna xwendekarên zanîngehan bû ku ji 21'ê mehê dê dest pê bibin.

Di nava vê dirûva aloz û nexweş de, gellek astengî derketine pêşberî rêwiyan û bi qaseke berfireh rêwî li ser rê û şeqamên bajarê Urmîyê tînin. Her wiha lawazî û kêmaniyên sîstema hatin û çûna giştî rewşê kûr û aloztir kiriye û tu berpîrsiyarek bersivderê xelkê nîne. Di halekê de ku li dema çêbendiya benzîne, berpîrsiyaran soza bihêzkirina alav û pêwîstiyên hatin û çûyîna giştî ji welatiyan re didan û niha bi barîna berfa kêmtirî 20 CM li Urmîyê, em şahidê dijwarî û nivîskanbûna jiyana xelkê ne.

Di vê rewşê û halî de, bazara firotina alavên germkerên niştê bi berfirehî heye û kesên ku van karane dikin, bi firotina çend qatan zêdetir a van alav û amûran, diraveke baş diçe berka wan. Xelkê bêçare mecbûr in ji bo sax û silametmana xwe wan alavan bikirrin tu organek çavdêriyê bi ser karê wan kesên qazanc û derfetperest tune ye û lêpîrsîne li ser

## ŞIROVEYA PEYVÊN SIYASÎ

Berhevkar: Omîd Esxeran

omid\_anbi@yahoo.com



### Komarî(Republic)

**M**odelek ji desthilatdariyê ye ku tê de desthilatdarî ne mîratî ye û heyama Serok Komariyê sînordar e. Di wî şewazê de, serokê welatê ku Serok Komar e, bi dengê rasterast û nerastrast yê gelê tê hilbijartin. Komar di warê wateyî de hilgirê beşek ji demokrasîyê ye, lê di heman demê de, gellek ji rejîmên dîktator ên neseltenetî(padîşahî) jî bi Komarî tînin binavkirin. Derheqê vê çendê, sîstema Komarî tenê bi wateya hikûmeta neseltenetî ye.

Berî şoreşên Amerîka û Fransayê, di hizra siyasî a Rojavayê de, sîstemek bi Komarî dihat hesabandin ku ewlehiya giştî a gelê dabîn bikira. Di vî warî de hikûmetên padîşahî û aristokrat û heta hikûmetên ku azadî sînordar dikirin lê li hember de ewlehiya gelê dabîn dikirin weke Komarî dihatin hesabandin. Derheqê vê çendê **Jan Bodin**, hizirvanê siyasî û civakî ê Fransayî di sedsala 18'an de, di pirtûka xwe a bi navê Komarî de, qala padîşahî, aristokrasiyê û dewleta gelê dike. Ji şoreşên Amerîka û Fransayê şûn de, Komarî wateyek yasayî bixwe ve digire. Di sîstema han de, mafên sîvil û azadiyên takekesî tînin garantîkirin û Komarî weke neyar li hember dîktatoriya seltenetî yan bi wateyek din, azadîxwazî(lîberalîzm)tê hesabandin. Lê piştî damezrandina sîstemên demokratîk li welatên seltenetî ên Ewropayê, Komarîxwazî wateya radikal a xwe ji dest dide, çûnku sîstemên seltenetî hêj wiha nişan didin ku rewatiya wan ji gelê hatiye wergirtin ne ji vî û îradeya Xwedê.

Hin kevneparêz(mohafîzekar)ên Amerîkayî, Komarê ji bo hikûmeta mercedar(meşrotê), hikûmeta yasa û yasayîbûna hikûmetê bi kar dibin û demokrasîyê weke (mobokrasi) yan hikûmeta xelkê nezan dihesibînin.

Em dikarin Komarê nû bi ser sê girûpan de parve bikin ku bi awayî ne:

1- Komara demokratîk: Ji modela hikûmetên Rojavayî ku di rastî de li ser bîngeha xwestek û daxwaza gelê hatine damezrandin û yasayî demokrasîyê bi tevahî bi ser de zal in û desthilatdarên welatê ji rêya hilbijartina giştî ve tînin diyarîkirin. Lê bo mînak asta desthilata Serok Komar û sînore desthilata wî li dewletên Amerîka û Fransayê ne wekî hev in. Li Amerîkayê desthilat di navbera Serok Komar û "Kongress"ê de tê parvekirin. Serok Komarê Amerîkayê, serokê hikûmetê û serokê wezîrê û hewcehî bi dengê pîrraniya nûnerên "Kongress"ê tune, Kongressê desthilata danîn û rakirina Serok Komarê ye û Serok Komar jî nikare Kongressê hilweşîne. Serok Komar dikare biryarên "Kongress"ê nepejirîne. Di wî welatî de, Dadgeha bilind a welatê çavdêriyê bi ser karê barê her du aliyên de dike û pîrensîpa cudahiya desthilatan li Amerîkayê bi tevahî tê çêbikîrin.

Lê li Komara Fransayê, desthilat di navbera dezgehên hikûmetî û Parlemanê de tê dabeşkirin. Serok Komar di wî welatî de xwediyê desthilatekê zaf e û ji ber ku karê barê ji rêya Serok Wezîr ve dimeşin, divê herdem li hember Parlemanê de bersivder be û hewlê bide ku herdem pîrraniyê di Parlemanê de biparêze.

2- Rejîma Komarî, ji modela Komarê Başûr û Navîna Amerîkayê: Welatê han her binav Komarî ne, çûnku daxwaza gelê xwediyê tu rolekê di birêvebirina karê barê welatê de nîne û pîvana cudakirina desthilatan nahê liberçavgiartin. Di welatê han de, hilbijartinê şanoyî ne û Serok Komar bi zor û bo heyameke nediyar desthilatdariyê dike.

3- Komarê demokratîk û gelî: Rejîmên ku li Ewropa û Asyayê Rojhilatê desthilatdariyê dikin. Di sîstemên han de, bi nav Piroltariya, yan texê û qata kedkar desthilatdariyê bi ser welatê de dike û ji ber vê çendê ku di wan welatan de tenê partiyên Komonîstî xwediyên mafê çalakiyê ne, desthilat di destê wan de ye. Di rastî de di welatê han de azadiyên weke azadiya çapemeniyê, azadiya ramanê û azadiya lidarxistina civînan tune ye.

Çavkai:

"Danişnamêyê Siyasî"

"Fehengî Ramiyarî Nîga"

## Encamnameya Azadiya Çapemeniyê Di Sala 2007'an De

## Kuştin, Çewsandin, Sansor

**D**i raporekê de, Rêxistina Nûçegihanên Bêsinor encamnameyek rewşa Çapemeniyê

di sala 2007'an de weşand. Li jêr em dê hin beşên wê daxuyaniyê bixin pêşberî xwendevanên Agirî.

Di vê raporê de hatiye: Di sala 2007'an de aliyê kêr 86 rojnamevan li seranserê cîhanê hatine kuştin. Ev hejmare her sal ber bi zêdebûnê ye û di dema 5 salên çûyî de, hejmara rojnamegerên kuştî jî 25 kesan yê gihîştîye 88 kesan ku zêdebûna 244 jî sedê li gorî vê heyamê nîşan dide. Serhejmariya herî nêzîk bi vê hejmarê, di sala 1994'an de bû ku di vê salê de 103 rojnameger di nîfşkujîya Rwandayê ê şerê navxweyî yê Cezayîr û Yûgoslavyayê hatin kuştin.

### Ji nivê zêdetir a rojnamevanên kuştî di sala 2007'an de li Îraqê hatine kuştin

Di vê derbarê de Nûçegihanên Bêsinor radigehîne: "Heta niha di çî welatekê de û çî demekê ev qasa rojnamegeran nehatiye kuştin. Li Îraqê jî destpêka êrîşa Amerîkayê di sala 2003'an heta îro, 207 karmendên medyayan hatine kuştin. Ne li şerê 20 salî yê Vîyetnamê û ne li neslkujiya Rwandayê û ne di şerê navxweyî yê Yûgoslavyayê de, kuştina vê hejmarê jî

goriyan di nav alîkarên medyayan de bêsabiqe bûye.

Rojnamevanên kuştî li Îraqê (47 gorî), jî bilî îstisnayekê ku nûçegihanekî Rûsî bû, hemû Îraqî ne. Wan hemûyan jî bo medyayên Îraqî kar dikirin û bûne goriyên cinayetn. Hemû ev kesane jî ber karê rojnamevanîyê yan wan medyayan e ku têde dixebitîn. Girûpên Çekdar li Îraqê, rojnamegerên medyayên nêzîk bi girûpa Olî an dijberê xwe re an kesên ku bi girûpên çapemeniya biyanî re kar dikin an çavkaniya diravî a biyanî hene, didin ber êrîşên xwe.

Li Somaliyayê 8 rojnamevan hatine kuştin. Di vî welatî de, pêla terorek bêsabiqe sala 2007'an kire sala herî zêde a kuştina rojnamegeran di dema deh salên borî de. Di sala derbazbûyî de, çekdarên Îslamî hêzên dewleta demkî û hevgeriyên Etyopyayê dane ber êrîşên xwe ên berdewam. Di rewşekê de ku medyayên biyanî naxwazin nûçegihanên xwe jî bo welatê herî xeter ê cîhanê bişînin, rojnamevanên Somaliyayî dibin goriyên tund û tûjî û aloziyan.

Li Pakistanê 8 rojnameger di sala 2007'an de hatine kuştin.

Li Serîlankayê 3 rojnameger jî ber xurtbûn û berdewambûna şerê navbera


hêzên Arteşê û Bebrên Tamîl hatine kuştin.

Li Eritreyê 2 rojnamevan hatin kuştin. Ev welate di encamnameya sala 2007'an a Nûçegihanên Bêsinor di pileya dawiyê de cih girtiye.

Berevajî rêxistinên din, serhejmariya Nûçegihanên Bêsinor tenê ew rojnamevanên ku mirina wan pêwendiyek rasterast bi erkê ragihandinê ê wan qewimî ye, li xwe digire. Vê rêxistinê dehan xalên kuştina rojnamevanan ku di bin lêkolînê de ne an bi sedema xuyanebûna sebebê kuştinê bi awayekî demkî daniye qiraxê.

### Di sala 2007'an de, her rojê 2 rojnamevan hatine girtin

Di destpêka Çileyay Paşîn a sala 2008'an, li seranserê cîhanê 135 rojnameger di girtixaneyê de ne. Ev hejmare di salên borî



Azerbaycan bi girtina 7 rojnamevanan di sala 2007'an de, hejmara rojnamevanên girtî li vî welatî, gihîştê 8 kesan. Ev rewşe li Azerbaycanê tiştek nû ye û rewşa nebaş a azadiya çapemeniyê û astengên zêdetir ên desthiltadaran li hember rojnamevanên rexnegir dide xuyakirin.

Îran di polênê rêzkirina sala 2007'an de, li nava 169 welatan di pileya 166'ê de cih girtiye. Li Îranê rojnameger tevî serkut û çewsandina xurt û berfireh a hukûmetê berbirû ne û jî wan re nadin ku rexne an daxwazek siyasî û civakî bigirin. Ji ber ku her sal Îran girtîgeha herî mezin a rojnamevanan di Rohilata Navîn de bûye. Niha 11 rojnamevan û 2 nivîskarên malperên înternetî li Îranê di girtîgehê de ne. Ednana Hesenpûr, rojnamevanê Kurd li ber xetera îdamê ye.

Hepskirin take rêya bêparkirina rojnamevanan jî azadiyê nîn e. Li sala 2007'an di 15 welatên cîhanê de, 67 rojnamevan û hevkarên medyayan bi rehî

hatine girtin. Devera herî bixeter li cîhanê hêj Îraq e û jî destpêka sala borî ve 25 rojnameger hatine revandin. Li Pakistan û Efxanistanê jî ev rewşe jî bo rojnamevanan heye.

### 2676 malperên înternetî û "weblog" hatine daxistin û xebata wan rawestayê

Nûçegihanên Bêsinor di rapora xwe de dide eşkerekirin ku dewletên wekî Çîn, Bûrma û Sûriyê hewlê didin tora înternetê bikin torek girtî û di asta dan û standinên hundirîn û navbera kesên

xwediyê îznameya bikaranîna înternetê. Rapora han destnîşan dike ku di sala 2007'an de, li seranserê cîhanê aliyê kêr 2676 malperên înternetî û weblog hatine daxistin û xebata wan hatiye rawestandî. Piraniya van malperan odayên gotûbêjê bûne. Lê Çîn mezintirîn sansorçiyê înternetê ye. Nûçegihanên Bêsinor dide zanîn ku Îran jî yek ji welatên serkutker û dijber di warê înternetê de ye û di nav lîsteya 13 welatên **dijminên înternetê** li cîhanê cih girtiye.

### Encamnameya azadiya çapemeniyê di sala 2007'an de

86 rojnamevan hatine kuştin  
20 alîkarên ragihandin û çapemeniyê hatine kuştin  
887 rojnameger hatine girtin  
1511 rojnameger ketine ber êrîşê û gef jî wan hatiye xwarin  
528 medya hatine sansorkirin  
67 rojnamevan hatine revandin  
**Înternet**

37 nivîskarên weblogan hatine girtin û binçavkirin

21 nivîskarên weblogan ketin ber êrîşê û gef jî wan hatiye xwarin

2676 malperên înternetê hatine daxistin (bloke) û xebata wan hatiye rawestandî



# Têgihîna Namûsê

**Îsmail Beşikçi**

**L**i bajarên kurdan ên mîna Bidlîs, Agirî, Batman, Diyarbekir, Ruha, Wan û Mûşê kuştinên ku wek

kuştinên namûsê, wek kuştinên edetan tên binavkirin, çê dibin. Ev kuştinên hanê di encama koçberiyê de êdî li bajarên wek Stenbol, Adena, Antalya, Mêrsin, Îzmîr û Sakaryayê jî çê dibin. Li van deveran têgeha namûsê di ser bedena jinê û zayendiyê re tê nasandin. Namûs di ser beden û zayendiya jinê re tê fêmkirin. Di nav malbatê de jinên ciwan yan jî keçên 15-20 salî li gundan yan jî li navçeyan ger bi awayekî nehîni ligel mêrekî di nav peywendiyê de be û ev peywendî ji layê malbatê ve bête bihîstin, hingê malbat vê yekî herwekî "namûsa me herimî, divêt bê paqijkirin..." têdighê, wisa fêm dike. Dibe ku ev peywendî bi zora mêrî jî çê bibe. Aşker a bûyîna peywendiyê jî, pirranî bi hemilbûnê re derdikeve meydanê. Malbat, ji ber ku leke li şerefa malbatê daye, hingê di vî warî de biryara kuştina keçikê didin û vî karî jî yan bi destê birayê piçûk yê jinê/keçikê, ger birayekî wisa nîn be, bi destê birayê mezin yan jî pismamekî wê didin kirin. Mezintirîn tundreviya li hemberî jinê bi vî awayî tê pêkanîn. Herwisa, ev jî tê zanîn, ew malbatên ku karên wisa dikin, di nav civakê de qedrê wan zêdetir dibe.

Televîzyon, rojname û radyo dema ku nûçeyên bi vî rengî belav dikin bal dikşînin ser meclisa malbatê: "Meclisa malbatê civiya. Bona paqijkirina vê lekeya li ser malbatê û bona parastina şerefa malbatê biryar hatiye dayîn ku ew jin yan jî keça ku di nav peywendiyên nehîni de ye, bête kuştin."

Li gund yan jî li navçeyê ger destê mêrekî li porê keçek yan jî jinekê bikeve, ev yek dibe meseleya namûsê. Bûyereka wisa dikare bibe destpêka şerekî xwînî. Aliyekî vê diyardeyê ev e. Lêbelê aliyekî din yê diyardeyê jî heye, ku tê zanîn, lê behsa wê nayê kirin, divesêrin. Her kes pê dizane lê ji nedîtî ve tê. Di vê gotarê de ez ê hewl bidime xwe da ku piçek bal bikşînin ser vê yekê.

Di herêma kurdan de ji sala 1984an û vir de, ev serê 25 salan e şer heye. Hêzên asayîşê her tim li gundan, li navçeyan operasyonan dikin. Carinan, jin û mêr û ciwan û pîr, giş bi hev re bi komelî tene girtin. Kesên ku tene girtin, carinan bi zincîran bi hev ve tene girêdan û wan dibin polîsxane yan jî meqerên leşkerî. Li van deran, hêzên asayîşê, jinên ciwan ji yê pîr cihê dikin û wan li cihêkî din girtî dîhêlin. Di lêpirsînê de ligel îşkenceyê tecawuz (destdirêjiya namûsa jinê) jî heye. Di vê prosesê de koricî (cehş), endamên

JÎTEMÊ, timên taybet (quwetî xas), cendirme, polîs û leşker bi darê zorê namûsa jinan diherimîn. Mêrên ku hatine girtin, ango bav û bira û mam û hwd. hay ji rewşê hene. Lêbelê li hemberî tiştên bûyî bédeng in. Ji nedîtî ve tên, her wekî ku tiştê wisa çê nebûye. Ew meclisa malbatê ku li gund, li navçeyê ji ber peywendiyeka li derveyî edetan dikare derbareyê jinan de, derbareya keçan de biryara kuştinê bide, lêbelê li hemberî wê herimandina namûsê ku li meqera leşkerî ji layê hêzên asayîşê ve çê bûye, bédeng dimîne. Ger destdirêjiyeka wisa ji layê hêzên asayîşê ve çê bibe, ji nedîtî ve tên, her wekî ku tiştê wisa çê nebûye. Ger li gund, li navçeyê, li bajêr ev peywendî bi yekî ji gelê wan re çê bibe, hingê dibêjin "namûsa me herimî, tenê kuştin dikare viya paqij bike", lêbelê ger ev destdirêji jî layê endamekî hêzên asayîşê ve bête kirin, hingê nabe mesele. Ew mêrê ku dibêje namûsa me herimî û bi xwînsarî gule berdide xwîşka xwe, qet bala xwe nade ser pêvajoyeka wisa, li ser vê yekê nafikire. Diyardeya namûsê çawa ku li gorî cih û



zemanê ku bûyer rû daye diguhere, herwisa, li gorî nasname û pişeya mêrî jî diguhere. Divêt ev peywendî, ev têgihaştin bi têgehên antropolojiyê bêne fêmkirin, bêne têgihaştin û rexnekirin.

Meclisa malbatê sazîyeka pîrîmîtîv e. Wekî mînak, di warê rêvebirina debara malbatê de, di warê kirin û firotinê, yan jî bo kirê dayîna milk de biryareka meclisa malbatê tune ye. Bona biryarên ekonomîkî ti pêwîstiyek bi meclisa malbatê nîn e. Derbareyê arîşeyeka aborîyê de nayê gotin ku "malbat civiya û biryareka wisa girt" û hwd. Wezîfeya meclisa malbatê tenê ew e ku derbareyê jin yan jî keçekê de bi mebesta ku li derveyî edet, dab û nêritan peywendî bi yekî re daniye biryara kuştinê bide... Ji bilî viya tu roleka wê nîn e. Dema ku çapemenî dibêje "meclisa malbatê civiya", "meclisa malbatê biryar da" hingê



ev yek ji bilî ku vê meclisê zinde bihêle, ne ti tiştêkî din e. Ger mesele were ser pîrsa kurd, hingê ev sazîyên kovî yê wisa ji layê dewlet û hukûmetê ve, ji layê çapemeniyê ve berevaniya wan tê kirin, wan teşwîq dikin. Statu didin van sazîyên kovî, wan geş dikin, pêşde dibin. Û bi vî awayî dikin ku ev sazî xwe birêxistin bikin, mayînde bibin. Wekî mînak, di zivistana sala 1990'î de hindê serekên korucuyan (cehşan) bo Anqereyê hatibûn vewxwindin. Ligel wezîrê navxweyî û serokwezîr û serokomarî hevdiştinan çê kiribûn. Wê demê jî çapemeniyê wisa nûçe belav kiribûn: "Serekê eşîra Batûwan ..., serekê eşîra Tayan ..., serekê eşîra Jirkî ..., serekê eşîra Mexmûran ... li Anqereyê ne. Ev serekên eşîran ku li ser vewxwindinê hatine Anqereyê ..." Li televîzyonan bi tevî dîmenên wan ve bername hatibûn çêkirin. Bi vî awayî dezgavê eşîretîyê hatibûn zindekirin, hatibûn parastin û geşkirin, hewl dabûn xwe da ku statu bidin van dezgavan. Di proseya berxwedanê de bi destê polîtîkaya dewletê eşîret wekî dezgavê hatibûn rêxistin kirin. Lêbelê ji layê din ve serokwezîr Bülent Ecevitî di dema serokwezîrtîya xwe de destûr nedabû şaredarên HADEP'î da ku werin pirsgirêkên xwe rabigihînin wî. Ecevitî bi mebesta ku "ew xwe ji rêxistina terorê dûr nagrin" jî van nedabû wan.

Ez dixwazim bibêjim ku çapemenî têgeha meclisa malbatê derdixîne pêş, hewl dide xwe da ku statuyekê bide vê dezgava pîrîmîtîv, bi baldarî dixwaze vê diyardeyê bike sazîyekê. Gelo ev meclisa malbatê dikare biryarek wekî "di girtinê komelê de em naxwazin jinên ciwan li cihêkî din girtî bimîn, wan ji komelê veqetînin û bibin cihêkî din, em qebûlê nakin ku ew li cihêkî din girtî bimîn..." bigrin? Dikare biryarek wek "em ê jinên xwe nespêrin bextê wan..." bigre? Nikare wisa bike. Lêbelê di bûyereka ku li gund yan jî li navçeyê rû daye, dikare tundtirîn zorbazîyê li jinan bike, qet tewsîr nake ku girantirîn cezayê ango cezaya kuştinê pêk bîne. Di têgihîna namûsê de, di têgihîna "namûsa me herimî" de, li gorî cih û zemanê wê, li gorî nasname û pişeya mêrî cihêtiyên mezin nîşan dide. Divêt meriv bi teferuat li ser

sedemên vê yekê raweste. Herwisa, di vira de şaştiyek jî heye. Gelo divê meriv li ku derê li vê şaştiyê bigere? Gelo divê meriv di nav edetên civakî de li vê şaştiyê bigere yan di wê texrîbata ruhî de ku di encama mekanîzmayên zordariyê yên hêzên ku bi awayekî hevpar kurdan xistine bin kontrolê pêk hatiye de bigere?

Kurd civakeka wisa ne ku nikarin xwe bi rê ve bibin, rê nayê dayîn ku ew xwe bi rê ve bibin. Kurd û welatê wan Kurdistan hatine cihêkirin, parçekirin û parvekirin... Di navîna Rojhilata Navîn de 40 milyon kurd bêstatu ne. Hêzên ku bi awayekî hevpar kurdan îdare dikin, gelek xirab îdare dikin. Di vê îdarekirinê de heq û huqûq tune ye; pelaxtin heye, piçûkxistin heye. Li cihanê ti miletekî din yê ewqas mezin û bê statu nîn e. Helbet em hay ji pêşveçûnên ku li derdora Dewleta Federe ya Kurd ku li Kurdistanê Başur çê dibin hene. Herwisa, ev jî tîye zanîn ku ev yek piştî çendîn berxwedaneka dûr û dirêj û dijiwarîyan de çê bûye. Ew hewlêdanên xwe îdarekirinê ku li parçeyên din yên Kurdistanê rû didin, ji layê hêzên ku bi awayekî hevpar kurdan îdare dikin ve tîne fetisandin. Ger bêhtirî sed salan ev proses li dar be, hingê dibe sedem ku di warê edetên civakî û tenduristiya ruhî de gelek xirabûn derkevin meydanê. Psikolojiya/derûniya kesên, ya civakê xira dibe. Civak û kes êdî ji xwe dûr dikevin, dikevin nav prosesê tevîbûna wê kultura ku li ser wan hatiye sepandin/empozekirin. Ger ev proses demeka dirêj dewam bike, dibe ku ev yek êdî bikeve nav DNAYA meriv û civakan. Ewên ku dikarin li hemberî gelê xwe gelek tund bin lêbelê li hemberî hêzên dagirker, li hemberî kesên ji wan hêzdarî fis dibin. Ev reftariyên berovajiyê hev, ku di meseleya namûsê de derdikevin meydanê, di wateya rizandinê de ne. Dema ku civaka kurd, nixên kurdan bi vî awayî di bin fişardinê de bin, hingê psikolojiya wan jî xira dibe, rizandineka wisa derdikeve meydanê.

Gelo riya rizgarbûna ji van peywendiyên lanetî, riya rizgarbûna ji vê prosesê lanetî û xwe dirêjî azadiyê kirinê, çi ye? Beriya her tiştî gelek girîng e ku divê meriv hay ji vê prosesê hebe, ji van peywendiyên agahdar be. Ew kesên ku hay ji vê prosesê bibin, gelek aşkera ye ku dê bi nixên xwe re bijîn, dê xwedîtiyê li nixên xwe bikin, dê van nixan geştir bikin, dê nixên ku li ser wan hetine sepandin/empozekirin red bikin, her ku biçe dê veşerî ser reseniya/orîjînalîteya xwe. Piştî ku meriv bibe 'xwe', hingê gelek hêsan e ku meriv bigihê mafê xwe, qet nebe di fiiliyatê de meriv dê bibe xwediyê mafên xwe. Ev prosesê lanetî, ev peywendiyên lanetî tenê dikarin bi vê yekê bişên

**Wergêr: Roşan Lezgin**

Zarathustra News

## Berfirehtirbûna Bikaranîna Madeyên Bêhişker Di Xwendingehan De

**C**ihgirê Wezîrê Perwerde û Werziş yê rejîmê, îtiyad di xwendingehan de weke tirseke

micid hesaband.

Hejmara kesên tûşbûyî bi madeyên sirker di xwendingehên Îranê de roj li pey rojê zêdetir dibin û berpîrsên pêwendîdar di demekê de nigeraniya xwe derheq rewşa han eyan dikin ku heya niha tu gawe derheq pêşgirtin ji xurtbûna tûşbûn bi madeyên hişber di nava şagirdan de neavêtine. Heta li gor gotinên xelkê sivil, hejmarek ji berpîrsên rejîmê di belavkirina madeyên sirker di nava xwendingehan de dest hene.

Li gor rapora rojnameya hikûmetî a "Comhoriyê Îslamî", Seyîdbaqir Pêşnemazî, Cihgirê Wezîrê Perwerdeyê di warê perwerde û werzişê li bajarê Sine de, bikaranîna madeyên sirker di xwendingehên Îranê de weke tirsek micid zanî û nigeraniya xwe derheq xurtbûna madeyên bêhişker di navendên xwendinê ên welat de diyar kir.

Li gor gotinên navhatî şagirdên navendên perwerdeyê yên parêzgehên ser sînor pitir ji şagirdên navendên



perwerdeyê yên parêzgehên navenda welat li hemberî gefa madeyên hişber û zîrar û ziyarên madeyên han de ne.

Navhatî sedema han vedigerîne ser kilkevta demografi a parêzgehên ser sînor di warê qaçaxa madeyên sirker de.

Pirraniya akinciyên parêzgehên ser sînor ku ji neteweyên bindest ên weke Kurd, Ereb, Belûç, Turkmen û ... pêk hatine, li ser vê baweriyê ne ku rejîma Komara Îslamî a Îranê bi armanca dîrxistina ciwanên neteweyên bindest ji xebata li dijî zulm û zordariyê, ji rêyên cur bi cur ve madeyên hişber di nava wan de belav dike. Her wiha nebûna kar di parêzgehên ser sînor weke sedemek din a jordecûna asta tûşbûn bi madeyên sirker tê hesabandin.

## Serhejmariya Dawîn Derheq Tûşbûyîyên Bi Nexweşiya "HIV"ê Li Îranê

**L**i gor rapora Nûçegihanên "ISNA"ê, heya roja 22.12.2007'an, hejmara kesên tûşbûyî bi nexweşiya "HIV"ê, gihîştîye 16679 kesên û di vê serhejmariyê de, 1269 kes di pileya xurt a nexweşiya "HIV"ê de ne. Eva di demekê de ye ku li gor serhejmariya Wezareta Tendurustî a rejîmê, sê meh berî berrava han, hejmara kesên tûşbûyî bi nexweşiya Îdzê, 1690 kes bûn.

Li gor serhejmariya han ji koma 16679 kesên tûşbûyî bi nexweşiya Îdzê, %94 ji wan mîr û %6 jî jin in.

Her wiha 11537 kes, anku %67/5 ji kesên tûşbûyî bi vê nexweşiyê ji rêya bikaranîna sûreng û derziyên pîs tûşî nexweşiya han bûne. Her wiha heya niha sedema tûşbûna %22/9 ji kesên tûşbûyî bi vê nexweşiyê ne rohn e.

%7/6 jî ji rêya pêwendiyên cinsî (zayendî), %1/5 jê ji rêya xwîna pîs û %16 jî ji rêya veguhestina vîrûsa "HIV"ê bo zarokan pêk hatiye.



Li gor rapora "ISNA"ê, heya niha 2382 kes li Îranê bi sedema tûşbûn bi nexweşiya Îdzê, jiyana xwe ji dest dane ku di vê hejmarê de 91 kes jin û 2291 kes jî mîr in.

Karnasên vî warî, serbarê ragihandina hejmara kesên tûşbûyî bi nexweşiya Îdzê ku pitir ji 100000 kesên tê texmênkinin, li ser vê baweriyê ne ku nexweşiya han bi sedema girîngînedana desthilatdarên rejîmê roj li pey rojê zêdetir dibin.



# ÇAND-HUNER-WÊJE

**ADAR JIYAN**

adarjiyan@mynet.com



Çand, hîmê jiyana neteweyekî ye. Ziman, wêje û huner, şaxên çanda civakê û rehên jiyana gel bi xwe ne. Çanda gel, bi van hêjahiyên neteweyî xurt û têtûz dibe û digihîje radeyeke berz û manîdar. Heta ku jiyana hebe, dê çand, huner û wêje jî hebe. Her wiha heta ku çand, huner û wêje jî hebe, dê jiyana jî hebe.

Pêşketina jiyana netewe an jî civakekê, girêdayî pêşketina çand, huner û wêjeya wê ye. Çand, her gav bi ziman dest pê dike, bi hunerê dipêrise û bi wêjeyê dikemile. Pêşveçûna çandê, girêdayî hunerê û ya hunerê jî girêdayî wêjeyê ye. Wêje, wekî din jî dibe misogeriya hebûna zimanê civak û neteweyê. Ango, ziman û zarava, her gav bi saya çand, huner û wêjeyê têne parastin.

Îro ro çî li Rojhilata Navîn û çî jî li tevê cihanê dibe, gellek wêjenas helbestkar û hunermendên ku li Rojhilata Navîn gihane (yên ku hem di ber civak û neteweya xwe de û hem jî di suxreya mirovahiyê de dixebitîn) hene. Û ew hunermend, bi rûmet û serbilindayî û fedekarî peywira xwe bicih tînin. Ji bo wê mirov dikare her gav rêz û giramiyê bide van kesan. Belê ne pêkan e ku mirov qedr û qîmetê bide yên seyr û sosret ên ku fêdeya wan ne li civaka wan û ne jî li gelên cihanê dibe. Bi vegotîneke gelêrî ew ên ku "ne ji defê re û jî ji zirneyê re dibin" in.

Divê gel jî di warê çand û hunerê de û perwerde bibe ku nema li wan kesên ku navê hunermendî, wêjenas û çandparêziyê bi ser xwe xistine (ku ne bi kurdî û ne jî bi zimanên din (erebî farisî û tirkî) dizanin, guhdarî bike. Çimkî ew bi her awayî ziman, huner, wêje û çanda hemû gelan dilewitînin, diherimînin û qetîl dikin. Bi kurdî, tirkî, erebî an jî farisiyê qirço-mirço û nîvco tu huner, muzîk û wêje nayê afirandin û rewandin. Ne mimkun e ku em nîrxê nedin zimanê gel û hêjahiyên hemû gelên dinê. Belê hunermendên ku bi eslê xwe laz, ereb, kurd û ermen in, çawa ku xisarê didin zimanê gelê xwe ewqasî jî xisarê didin zimanê tirkî, erebî û farisî, lazî û suryanî jî. Tu ji wan jî nizanin zimanekî xweşik û gewzîn bixebitînin û muzîka gel pêk bînin. Ji ber ku bi kurdî baş nizanin, nizanin zimanê biyanî jî bi kar bînin. Bi qirik û bilêvkirinên xwe yên beloq, digel zimanê kurdî zimanê gelên din jî xera dikin.

Wekî din jî divê hemû gel li ziman, çand, huner û wêjeya xwe xwedî derkevin. Naxwe dê her tişt wekî îro li nav hev û din

bikeve û tu tişt li ser a xwe namîne. Ji vê hêlê ve gelên Rojhilata Navîn van çend salên dawî li çand, huner û wêjeya xwe xwedê derdikeve û ji bo gelên Anatoliyê, Mezopotmayayê û Rojhilata Navîn dibe mînak. Îro bi hezaran weşanên kurdî, tirkî, erebî, farisî û hwd derdikevin. Çî li Rojhilata Navîn û çî jî û çî li tevê dinê, rojname û kovarên wêjeyî têne weşandin. Her wiha bi hezaran pirtûk têne çapkirin. Bi milyon kaset û sêlikên muzîkê têne tomarkirin. Wekî din jî bi hezaran helbestvan, çîroknivîs, dîrokzan, perwerdekar, sendiqevan, nivîskar, rewşenbîr, siyasetmedar, parlamen xwe gîhandine û bi zimanê xwe berhemên xwe diyarî gelê herêmê û pêşkêşî mirovahiya cihanê dikin. Berhemên wan li çarmedorên dinê belav bûne û ev yek bûye sedema nasandina çand, huner û wêjeya Rojhilata Navîn. Îcar ev merhaleyê girîng e. Divê hemû gelên bindest û mêtîngêh vê yekê ji xwe re wekî mînak bigirin û arasteyî nîrxên xwe yên neteweyî bibin. Çimkî gelên Rojhilata Navîn încex dikarin bi vî awayî biratî, aştî û azadiyê rastîn bidest bixin û bibin sedema yekîtiyê û yekbûniya welatekî mayînde û hevpar.

Gelo mirovê/a ku haya wî/ê ji van wêjevan û ramanwerên wî/wê tunebe dikare derbarê çand û huner û wêjeya Rojhilata Navîn de biaxive? Mirovê/a ku haya wî/ê ji çand, huner û wêjeya Rojhilata Navîn tunebe, dikare li nîrxên xwe yên neteweyî û dîrokî xwedî derkeve û xwe bextewar bihesibîne? Mirovê/a ku ji çand, huner û wêjeya xwe sûd wernegirtibe, gelo dikare hestên xwe bîne ximên û fikr û ramana xwe derbibere? Heke ku dikaribe jî dê çi qasî, bi çi awayî, ji kê re an ji bo kê bîne zimên?

Divê gelên Rojhilata Navîn (kurd, tirk, ereb, faris, laz, çerkez Asûrî, keldanî û hwd) di vê maweya dîrokî de, li ber xwe bidin. Û her wiha ji bo ku li ber bayê globalîzmê neçe, li çand, huner û wêjeya xwe, xwedî derkevin. Heke ku gelên Rojhilata Navîn xwe li hember çanda kolonyalîzmê/împeryalîzmê ango rewşa pergala cihanê ya nû neparêze û xwe ji ber bayê globalîzmê nede alî dibe ku di demê nêzik de, zarok û neviyên wan, berî ku xwe wekî zarok an ciwanekî/e kurd, tirk, laz, çerkez ereb, faris, asûrî tirkmen bihesibînin; pêşî xwe wekî zarok û ciwanekî/e emerîkî an jî îngilîzî bihesibînin û bijîn.

*Kaniya Helbestan*

## DIGRÎM



**Dildar Îsmail**

dildarismail@hotmail.com

Digrîm û dilê min  
Wê şevê ez û te  
Di xewnê de digrîm  
Çavên bê rûndik  
Çavên ziha  
Li ser bedena te  
Li ser pêşîra te  
Têne xwar  
Kul û derdên demê  
Dîjwanin  
Dema bê bext  
Rêça min û te  
Gifî û gazin jî her der  
Ramanên dûre dûr  
Kevza çemên ne kûr  
Digrîm li ser  
Melûlya çavên te  
Dêmin jî hêstran  
Ku xema dikşînin  
Sare dojêha bê evîn  
Bihuştê bê dilvîn  
dengê giriyê min  
Li hev di vegere  
Li odeya bê derî  
Newala bê dar  
Çiyayên bê zar  
Digrîm jî ber  
Civîna çavên xemgîn  
Tariya riya dûrbûnê  
Bê jimar dibhure temen  
Tû nabhîze dengê dil  
Tû nabhîze qêrîna şil  
Qêrîna bê saman  
Qêrîna dildarê evînê  
Hêvî jî hêviyê cudaye  
Evîn jî xezema daxdaye  
Digrîm her şev û roj  
Di nîvê şevan de  
Û di nav bera rojê de  
Têne min awirên te  
Çavên reşî ar  
Dikim qîr dibim bê zar  
Digrîm û digrîm

## Panoramaya 2007'ê Li Ser Rewşa Ziman, Çand û Rewşenbiriya Kurdî

**D**i qada çand, ziman, rewşenbîrî û hunera Kurdî de îsal gellek festîval, pêşveçûn, pêşengeh, çalakiyên cur bi cur pêkhat.

### Konferansa Ziman

Li Parlemantoya Belçîka li Brukselê, sempozyûma li ser zimanê kurdî û perwerdeya bi zimanê kurdî hate lidarxistin. Di encamnameya sempozyûmê de tê xwestin ku zimanê kurdî wekî zimanê tirkî di pergala perwerdehiya fermî ya dewletê de cih bigire. Di encamnameyê tê gotin ku makezagona Tirkiyeyê li hemberî perwerdehiya kurdî astengeke mezin e. Her wiha di encamnameyê de hate ziman ku ev zordayîna YE'yê ji bo zimanên din yê di derveyî tirkî de jî bê kirin û divê der barê perwerdeya bi kurdî de **YE** bêtir nêzik bibe. Ji bo perwerdeya bi kurdî jî ji bersivek tirk re bang hate kirin ku bila di pergala perwerdehiyê de guhartin bê kirin û rê li pêşiya kurdî bê vekirin û kurdî di dibistanên bilind û zanîngehan de bibe zimanê perwerdeyê.



### Galaya Kurdê Salê

Nûneratiya Hikûmeta Kurdistanê li Bakûrê Ewropayê eva du sal e ku ji bo kurdê salê û dostê kurdan li Swêdê hilbijêre, gale amade dike. Galaya îsal di 25.01.2007'ê de li Stokholmê li Teater Sodra pêk hat ku têde gellek Kurd û Swêdî bêsêdar bûn. Li ser navê FKKSê jî seroka FKSS'ê Aycan Şermîn Bozarlan bêsêdar bû.

### Komaleya Ehmedê Xanî

Di salên dawiyê de li Bakûrê Kurdistanê li nava kultur, huner û zimanê Kurdî valakirin dest pê kiriyê. Me jî li dijî wê, Komela Ehmedê Xanî a Kultur û Huner damezirand. Gelên weke Kurda di bin nîrê dagirkeriyê de dijîn, ji bo ku kultura xwe biparêzin û heyîna xwe berdeham bikin, xweparastin şert e. Divê mirov nehêlê dijmin têkeve derdorên kultura Kurda û pêwîst e Kurd siyaseteke kulturî terxan bikin.

### Kongreya Kurdî-Der

Kongreya asayî ya yekem a Komela Pêşxistin û Lêkolînê ya Zimanê Kurdî hate lidarxistin. Komela Pêşxistin û Lêkolînê ya



Prof. Dr. Ordîxanê Celîl

Zimanê (KURDÎ-DER), yekemîn kongreya xwe ya asayî li Enstîtuya Zimanê Kurdî ya Amedê lidar xist.

### Konferansa Bîrê Neteweyî

Navenda Rewşenbîriya Kawe bi alîkariya Serokatîya Zankoya Selaheddîn li Hewlêrê, konferaseka 4 rojî li ser "Bîrî Netewî" çê kir. Di konferansê da gellek aliyên bîrî netewî, wekî dîrokî, civakî, aborî, rewşenbîrî kete ber behs û lokolînê.

### Konferansa Dîroka Kurdistanê

Li paytextê Swêdê Stokholmê, konferansê li ser dîroka Kurdistanê hat derbaskirin. Konferansa ku ji aliyê Federasyona Komeleyên Kurdistanê hatibû amadekirin, bi hewes û baldariyê mezin hat gudaçkirin. Di destpêkê de ji bo rêzgirtinê ji canê pak yê şehîdan deqîqeyek bi bêdengî rawestan. Dûra Seroka Federasyonê Şermîn Bozarlanê xêrhatin li bêsêdar û mêvanan kir. Pênc pispor û zanayên bêsêdarbûyî, di babetên cuda da li ser dîroka Kurdistanê agadarî dan. Di dawiya konferansê da, wan bersiva pirsên gudaçan dan û konferans bi awayekî serketî derbas bû.

### Kampanyaya 100.000 Îmze Bo Zimanê Kurdî

Hevgirtina Rewşenbîrên Kurdên Rojava li Derve "HRKRD" ji serê sala nû û vir ve di gel UNESCOyê di hewldanê de ye daku îmzeyên berhevkerî tevî belgenameyekê li ser rewşa zimanê kurdî radestî wê bike. A niha jî pirs wergirtina îmzeyan li ber destê serokê sazîyê ye, hêviya me ew e ku di nêzikîrîn wext de bersivêke erênî bide me.. "Kampanya berhevkerina 100.000 îmze bi dawî bû.

### Festîvala Amedê

Festîvala Çand û Hunerê ya Amedê bi bêsêdarbûna bi dehan hunermendan hate li dar xistin.

### Zextên Ser Zimanê Kurdî

Tehemûla dewletê ya li hemberî zimanê kurdî her ku diçe, namîne. Ji ber ku bi xebata sazî û dezgehên kurdî li hemû bajaran, kurdî bi pêş dikeve. Ev yek dewletê dixê nava tirs û fikaran. Ji bo ku dewlet pêşî li zimanê kurdî bigre û kurdî bihelîne, êrîşên xwe yê li ser kurdî diwartir kirin.

### Li Başûrê Rojavayê Kurdistanê, Konferansa Zimanê Kurdî

Li Başûrê Rojavayê Kurdistanê bi dirûşma **'Zimanê me hebûn û rûmeta me ye'** konferansa zimanê Kurdî hat lidarxistin. Konferansa Saziya Zimanê Kurdî li Rojavayê Kurdistanê di 24'ê Tîrmehê de hat lidarxistin... Di konferansê de bêsêdar bi awayekî berfireh li ser rewşa zimanê Kurdî û astengiyên li pêşiya ziman rawestiyân...

### Festîvala Gimgim

5'emîn Festîvala Girê Koxê ya ku ji aliyê Şaredariya Gimgimê ve hatibû oragnîzekirin, hate lidar xistin.

### Ordîxanê Celîl Derket Rêwitiya Dawiyê

Zimanzan û wêjevan Prof. Dr. Ordîxanê Celîl ku yek ji kesayetiyan bi nav û deng ên kurd e û nayê jibîrkirin, di 75 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe. Ordîxanê Celîl ku li ser zargotina kurdî bi dehan berhemên wî hene, li hemberî doza kurd jî gellekî bihestiyar bû.

### Festîvala Cemîl Paşa

Festîvala Rêzgirtina Neteweyî bo Binemala Cemîl Paşa yê Diyarbekirî, li Hewlêrê hate lidarxistin.

### 15'emîn Festîvala Gelawêjê Li Silêmaniyê Çê Bû

Bi çavdêriya serokê Hikûmeta Kurdistanê Neçîrvan Barzanî û bi serpereştiya Mela Bextiyar li bin dirûşma "Serkeftina azadî, asûdeya mirovayetî ye" 15'emîn Festîvala Gelawêjê, di 20'ê Sermawezê de li îlêmaniyê hate lidarxistin.

### 'Navenda Lêkolînên Zanistî Ya Stratejîk'

Li Başûrê Kurdistanê li Hewlêrê Navenda Lêkolînên Zanistî ya Stratejîk hate vekirin (18'ê Nîsanê). Ew navende kar û xebatê dikin ku zanîngeh û sazîyên Başûr bi hev re xebatên zanistî bikin.

### Şakiro Xido

Kurdolog Şakiro Xido çû ser heqîya xwe.

### Nedîm Dagdevîren

Serokê Kitêbxaneyê Kurdî ya Stokholmê Nedîm Dagdevîren, li Stokholmê wefat kir. Nedîm Dagdevîren di damezrandin û rêvebirina kitêbxaneyê kurdî de xwedî ked û xizmeteke berbiçav bû.

### Kareograf Dansê Yê Fransîz-Kurd Bêjart Mir



# “Tiyatra Sêyem” Li Dîtina Yocîno Barba De

**N: Fatih Salihî**  
**Wergeran: Selîm Zencîrî**

**Y**ocîna Barba dîtînen xwe li dor civaknasiya şanoyê, di gotarek bi navê “Tiyatroya Sêyem” de aniye holê. Mijarek ku tevî tiyatroya fermî û tiyatroya “Avangard”(pêşeng) pêwendî heye. Tiyatroya Sêyem li dirêjîya salên ne gellek dûr di hin welatan de serî hildaye. Şanoyek nenaskirî ye û gellek bi kêmi rengvedana wê hebûye. Tiyatroya han li Festîval yan di biyavên rexnê de pêgeh û cihek wiha nine û wiha tê xuyakirin ku di kopika nasnekirinê de pêk hatibe. Metodeke e ku nasîna wê bi dîtîna û xwendînek ferhengî re pêwendî heye.

Ev tiyatroya tevî tiyatroya fermî pêwendî heye, ji ber ku ji rêya bihayên çandî ve derbas bûye, paşan ber bi aliyê derve hatiye rakîşandin. Piştê jî weke wênayekê li hember hev derketina zindî digel deqên kevn û îroyîn de xwe fêr kiriye.

Ji aliyê din ve bi tiyatroya pêşeng, ezmûnxwaz, dijwar û

Deconstruction (pêkh atêşikên) ve di pêwendiyê de ye, çunku şanoyek e ku ji bo peydakirina çavkaniyek resen, herwiha zalbûn bi ser kevneşopîyan de berevaniyê ji xwe dike, heye ku şêwe û metodên nû ji bo hînîkirinê bibîne. Pênasandin û analîzên Yocîno Barba li tiyatroya sêyem, tevî çalakî û



xebatê gellek ji girûpên şanoyê hevterîb e.

Tiyatroya Sêyem mijar û pênaseyek e ku ji qonaxa çêbûnê de bihuriye. Awa û şêwazek e ji tiyatîrê ku ne fermî ye û ne jî awangard. Lewra heke fermî û awangard nine, çi tiyatroyek e? Tiyatroya Sêyem, diyardê û berçavîyek e ku dest dixê nav zarê jiyane, heya ku bikare destkevtê hebe. Eva ku ev tiyatîrê ji mijar û nasnaweyêke diyarîkirî bêpar e û di bin siya tiyatîrê fermî û awangard de bi dijwarî jiyane diqedîne û di hundirê xwe de hêvî dike ku tevî yek ji wan du formên tiyatîrê be.

Helbet hemû vana bi awayekê şiroveyên şaş in ji tiyatroya sêyem, çunku Yocîno Barba di pirosiyek pragmatîk de tiyatîrê sêyem dide nasandin. Ev tiyatîrê li tenîşt tiyatîrê zal bi ser pêvajoya hunerî a tiyatîrê de dijî yan heta li derveyî navendên çandî û hunerî de mijûlê bêhnkeşanê ye.

Şanoyek e ku bi destê wan kesan çê bûye ku wan xwe weke wergêr, derhêner û

çalak di warê tiyatîrê de bi me dinasînin. Her çend ku zaf bi kêmi tîna dîtîna ku xwendîna di astek bilind di zanîngehê de hebin. Her bi wê sedemê rengê wekî kesayetiyeke pîşeyî û pişpor nehên nasîn, lê ew kesane jî bi tu awayekê amator ninin, belkî ew kes in ku bi mifahstandin ji metod û zanîstên tiyatîrê dest davêjne ezmûn û nîşandana tiyatroyê û ji wê rêyê ve mijûlê perwerde û hînîkirina durust û lojîk in. Herwiha bi berhevanîna tiyatîrê dixebitînin ku temaşevan û alîgirên zaf bo aliyê xwe rabikêşin.

Yocîno Barba di sala 1977'an de pênaseyek ji tiyatroya sêyem pêşkêşî ragihandinê gîştî kir. Bo mînak li Îspaniyayê de, bizavek bi navê Tiyatra Serbixwe ya Îspaniyayê çê bû ku ji 90 girûpên tiyatîrê pêk hatibû. Li Îtaliyayê zêdetir ji 100 girûp û li Danîmarkê de jî girûp û bizava Şanoyên Amator pêk hat. Nimûneyek din serhildana ji nişkêve ya girûpên tiyatroyê di Amerîkaya Latîn de bû. Barba herwiha didomîne û dibêje:

sereke yê/a tiyatîrê sêyem, weke hikûmetek xwehez e ku dest davêje berhevanîna hin peyv û pênaseyan ku nenaskirî, xerîb û biyanî ne û nemaze bala kesê/a jî nakîşîne. Endamên tiyatîrê sêyem bi beşdarîkirinek gîştî ji ber lêkolîn, vekolîn û perwerdeya zimani li pey metodek nû ji nîşandan û afirandina wateyên nû digerrin ku kesê/a pûte û girîngî pê nedaye, heya ku ji wê rêyê ve pencereyek nû û balkêş li rûyê tiyatîrê vekin ku li tamfîtiyatroyan de û li ser seko (sin) ya nimayîşê ji ber şêwaz û metodên tiyatîrê li pêş çavê temaşevanên tiyatîrê de hatiye daxistin.

Tiyatra sêyem, şanoyek e ku mandîye ji metod û şêwazên tiyatîrê fermî herwiha komnebûna wan metodan bi liberçavgiyêna kêmasiyên tiyatîrê “avangard” ku gellek caran bîner ji bîr dike û ji bo pêşveçûna pêvajoya tiyatîrê, teqînekê di hîma û îşareyan de çê dike ku bi sedan salên din jî kes lê halî nabe, çarçoveyek din bo afirandina wateyê peyda dike heya ku bînerê/a mandî ji bîhanîbûn û teknolojiya serdem, çî din zaftir hest bi xerîbî û biyanîbûna xwe neke. Herwiha bikare ji rêya sêyemîn ve temaşevan hay bide ku seferekê di hundirê xwe de bike û serbarê têkçûyîna hemû mana û wateyên jiyane, wateyek din û sêyem bo domandina jiyane peyda bike.

Her çîqas yên ku dixwazin dest bavêjne afirandina tiyatîrê sêyem, bê guman divê di hemû warên tiyatîrê B û C de şarezayî hebin heya ku bikarin bi afirandin û berhemên nû, gotînek nû bo mirovên mandî ji teqîna bihayên mirovî hebin.

Kareografê fransîz ê bi eslê xwe xwe kurd Maurice Bejart di 80 saliya xwe de li Lozana Swisreyê jiyana xwe ji dest da (22'ê Mijdarê). Kurdên Fransayê bi vê xeberê xemgîn bûn. Bejart navê xwe ji navçeya ‘Bijar’ li Rojhilatê Kurdistanê digire ku pîra wî li wir dijîya. Gellek bandora wî li ser hunermendên kurd hebû, digel vê bi bandora terîqetêke kurd re wî eleqe nîşanî misilmantî jî da. Lê eleqeya wî ya mezin li ser Zerdeştî bû, felsefeya Zerdeştî radixist ber çavan. Bejart li dinyayê de dihat nasîn. Ew wekî bavê dansê dihat bi nav kirin.

## Zarokên Amedî li Amerîkayê bi kurdî stran gotin

Koma Dengê Zarokên Amedê ya Şaredariya Yenîşehîrê li bajarê San Francisco ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) di Festîvala Muzîkê ya Cîhanê (3-7 cotmeh) de bi kurdî, ermenî, suryanî, îbrânî, îngilizî, almanî, rûsî û tirkî stran gotibûn, Wezareta Karê Derve ya dewleta tirk li ser vê çalakiya wan a hunerî lêkolîn dabû destpêkirin û paşê jî di derbarê wan de lêpîrsin da destpêkirin.

**Çavkani: HAWAR DENGÛBAS**

## Di Yekemîn Rojên Sala Nû A 2008'an De, 13 Kes Li Îranê Hatî Îdamkirin

Li gor rapora Ajansa Fransayê a Nûçeyan, Komara Îslamî a Îranê di rojên yekemîn ên sala nû a 2008'an de, 14 kes bi taybet jinek ciwan û dayîka 2 zarokan îdam kir. Jina daliqanî **Rahile Zemanî** bû. Ji bilî vê jinê, 7 mêr di girtîgeha Êvînê, 3 kesên din li bajarê Qumê û 2 kesên din jî li Zahidanê li ber çavê xelkê



hatin îdamkirin.

Di sala 2007'an de, aliyê kêr 300 kes û di di sala 2006'an de jî 177 kes li Îranê hatine daliqandin. Navend û rêxistinên mafê mirovan li hember pêvajoya xurt a îdamên li Îranê di çend mehên borî de nerazîbûna xwe ,xuya kirin, dikin. Komara Îslamî a Îranê sala borî rekorda îdamên li cihanê şikand. Çendîn kes li benda îdamê ne. Nemaze rojnamevanê Kurd, Ednan Hesenpûr.

## Kîvî Mêweyê Baş A Demsala Zivistanê

Em di werza sir û seqemê de ne. Zanyariyê xwarinê dê alîkariyê bide me ku em ji nexweşiya sirxwarinê di sermaye zivistanê de xwe biparêzin.

Yek ji mêwê (Fêkî)yên demsala sar a zivistanê Kîvî ye ku di nav mêweyên heyîn, weke çavkaniya dewlemend a vîtamîna C tê hesabandin.



Vîtamîna C a kîviyê bi qasê ke ye ku

hinek jî lêkolînan dibêjin qasê vîtamîna C a wê jî her tiştî, nemaze tiştên tamtirş jî bo xwarinê zêdetir e.

Ji ber vê çendê ku ev fêkî çavkaniyek girîng jî vîtamîn C'yê tê zanîn, ji bo berlêgirtin jî tûşbûn bi nexweşiya sirlêdanê xwarineke pîrr baş e. Xala balkêştir ev e ku hin kes kîviyê bi qalîkê wê re dixwen û sipî nakin, dibêjin xwarina 4 kîviyan di rojê de, pirsgrîkên hebûna zext û givaşên rojane û bêxewiyê jî jî nav dibe.

## Ji Ber Rûniştina Li Rex Ala Kurdistanê Kete Ber Êrişê Nasyonalistên Tundajo Ên Turkiyê

Medya û çapemeniya ser bi girûpên nasyonalistên tundajo û netewexwaz ên Turkiyê, hunermend **Mahsûn Qirmizî Gul**, stranbêjê Kurd ê vî welatî dane ber pêla xurt ya êrişên propagandayî û ew bi piştgirî jî PKK'ê tawanbar



kirin.


Medyayên radikâl ên Turkiyê vê dawiyê wênayê Mahsûn yê rûniştî li rex Ala Kurdistanê bi awayekî berfireh weşandin. Ev wêne çend salan berî niha û li dema sefera wî jî bo Başûrê Kurdistanê hatiye kêşandin.

Tê gotin êrişên vê dawiyê yê hêzên nejadperest ên Turk li dijî hunermend Mahsûn, jî ber belavbûna filma herî dawî a wî ku tê de Mehsûn hêzên Turk bi tundî rexne kirine, derket holê.

## Ji Bo Çavên Mandî Li Kompyuterê Çareserî

Heke hûn ji wan kesan bin ku di rojê de demeke zaf tevî kompyuterê derbas dikin, bêguman hûn ji mandîbûna çavên xwe nerazî û nerihet dibin, eva jî wilo dike ku hûn seh bi van nîşanane bikin:

**Mandîbûn û êşana çav tevî xwerin û hişkbûnê,**



**dîtina bi lêlî û nezela, lawaziya temaşekirina li tiştên dûr piştî nêrîna zaf li şaşeya kompyuterê, serêşî û azara masûlkeyên skura mirov, zêdebûna sehkirin bi ronahiyê, gursiya karîn û şiyana dêhn û baldariyê di dema guherîna xwendina deqeke nava kompyuterê û deqa ser kaxizê.**

**Bona vê yekê jî hewce ye hûn van xalên jêrîn berçav bigirin:**

1. Demekê jî bo veheviyanê bide çavên xwe, li her 10 deqîqeyan, bo dema 10 çirkeyan dûr li şaşeyê binêre.
2. Di encama lêhûrbûna zaf û baldanê, çav tûşî hişkiyê tê, çavê hin kesan bi kêrî rastî livandinê tê, renga di deqîqeyekê de carekê wisa jê bihê. Di demekê de ku livîna çav di her 5 çirkeyan de carekê xwezayî û pêwîst e, ji ber ku livîn çav terr dike û pêşiya hişkbûnê digire.
3. Bona pêşgirtin jî mandîbûna çav danîna şaşeya kompyuterê li ciheke jêhatî gellek girîng e, bi curekê be ku dûriya şaşeyê jî çavê te 60 – 80 CM be û bilindî û nizmiya wê di asta te de bibe.
4. Şaşeya kompyutera xwe bi paqijî rabigre, ax û toza ser şaşeyê ronîya temaşekirinê kêr dike, eva jî şav çeqî dike.
5. Heke mandîbûna çavên te gellek kişand û te êş hebû û tu pê aciz bûyî an te hest bi lawazî û têkêldîtinê kir, serdana bijîşk bike.

## Serokê Parlemana Turkiyê: “Azadiya Perwerdehiya Zimanê Kurdî Dê Turkiyê Parçe Parçe Bike

Serokê Parlemebtoya Turkiyê, **Koxsal Toptal** di hevpeyivînekê de bi televîzyona CNN TURK'ê re got ku azadiya mafê perwerdehî bi zimanê Kurdî dê vî welatî bi xetera parçe parçebûnê berbirû bike. Ji ber ku bi raya wî ev kar dibe



sedema dûrketin Kurdan jî civaka Turkiyê.

Wî zêde kir û got: “Heke ji bilî zimanê Turkî, zimanekê din di sîstema perwerdehiyê de were xwendin, Turkiye dê rastî parçe parçebûnê bihê û emê çand û zimanê xwe a nivîskî jî jî dest bidin.

Ji destpêka Komara Turkiyê heya niha, neteweya Kurd jî mafê xwendin û perwerdehiya bi zimanê Kurdî hatiye bêparkirin.